Chavkanîyên Belgeya „ Agahîyên Dibistana Bingehîn“
bona DÊ Û BAVAN

Armanc ewe ku, her zaroka ku derbasî Dibistanê dibe, bi awayekî tenahî û shexsî perwerdekirin û pêshvechûn werê meshandin. Mala Dê û Bav, Dibistana Zarokên Hûr (KîTa) û Dibistan hevshirîkê berpirsyartîya zaroka derbasî Dibistanê dibe. Heke bash bi hev û din re kar bikin, zarok bi hesan chûyîn û derbaskirina Dibistanê bi ser bixe.

Belge rêvechûyîneke pratîke, da ku zanistîya ilmê terbîye û pedagojîya Dibistana Zarokên Hûr (KîTa) û Dibistana Bingehîn bi hevre girêde. Hevkarkirinê hesan dike, bi taybet jî, heke peyv û axaftin navbera kesên pêre girêdahî ne nikaribe werê kirin (Mînak: Herema Dibistana Zarokên hûr (KîTa) û / an jî Dibistana Bingehîn fereh be, Malbarkirina zarokê hebe).

• Belge li ser dilxwazî û hêzên zarokê ye.
• Her weke din jî dide xuyakirin, chî zarokê girînge, di derbara shopandinê de, bash were guhdarkirin.
• Belge dîtina Dê û Bavan û dîtina Dibistana Zarokên Hûr (KîTa) li ser dema derbasbûyîna zarokê ya Dibistanê û kîjan Dibistanê "raste" ye. Pisporên pedagog û zanyarê ilmê terbîye yên dibistana Zarokên hûr (KîTa) zarokê di dirum û shûnên din de dibînin û derfetên Dê û Bav jî herwusa di mala wan de heye.

Shopên pirsa li ser derbasbûyîna Dibistanê (Pirsa 5):

• Biryara girtina Dibistanê di destê Rêvebirîya dibistanê de ye. Bingeha biryara girtina di Dibistanê de chavkanîya derbasbûyîna dibistanê ye, herwusa jî xwesteka dê û Bavan û pêshneyaza Dibistana Zarokên hûr (KîTa) tê berchavkirin.
• Bona derbaskirineke serbiketî dem û fersend bidin zarokê. Heke dîtinê we û yên Dibistana Zarokên hûr (KîTa) cuda bin, li ser dem û wexta derbasbûyîna Dibistanê, ev bona Rêvebirtîya Dibistanê dibe mahên û mahne, da ku bashtir li zaroka we û wesîyeta wê guhdar bike û hevdîtinekê navbera sê alîyan, yek alî hun, Dê û Bav, alîyê din pispora berpirsyar û Rêvebirtîya dibistanê li dar bixe.

Dagirtina belge karê Dibistana Zarokên hûr (KîTa) û Dê û Bavan e. Dana Belgeye bona Dibistana Bingehîn (di dema chavkanîyê derbasbûyîna Dibistanê) ji alîyê Dê û Bavan tê kirin. Bona dagirtin û dana Belge Dê û Bav bi riza dilê xwe ne. Heke nekeve destê dibistanê, heye ku di pola 1. (klasa yekê) de, demeke hêja bona fêrbûnê wenda bibe

[1] Amadekarîya Belgeya „Agahîyên Dibistana Bingehîn“ ji alîyê Dezgeha Hikûmetê bona Pedagojîya zûzanîn, Berprirsyarîya parastina agahî û zanînên Wezareta Civak û Chand û Berpirsyarê Welayeta Baverya bona parastina agahî û zanînan.